

## Zimanhezên hêja.....!

Rast e , rewş û deraqê gelê me weke me li jor diyar kirî , ne xweş û li saz e . Lê , em dikarin bibêjin ku , ev bûneya bûneyeke pîroz e . Beşdariya kesên weke we zimanhez û bi rûmet di vê civata salane ya yekem de , piştî civata damezrandina Saziya fêrkirin û parastina zimanê kurdî li Sûriyê , li 3.4 . 2007an , bihna mirov fere dike , û hêviya hebûna zimên û Kurdayetiyê bilind û geş dike .

## Xwîşk û birayên delal.....!

Tucarî xebata we ya fêrkirina zimanê kurdî , bi awakî rêk û pêk di çarcewa S.F.P.Z.K.s de , ne karekî biçûk e . Belê , ew li cem mirovên dûrbîn , karekî zor mezin û pîroz e . Ji ber ku , çî xebata di ber zimên de be , xebata hebûnê li hember nebûnê ye . Ne hewceye em pir di vî warî de dirêj bikin , ji ber ku , em bawerin ku , hemî beşdar têdigihên giringiya pirsê zimanê kurdî di jiyana û hebûna gelê me de . Wêlomê jî , parek ji wext û jiyana xwe dane fêrkirin û parastina zimanê dê , û îro li vir hazir in .

## Nirxandina xebat û calakiyên Saziye li dirêjiya salekê :

Piştî borandina bêtirî salekê di ser damezrandina saziya me re , pêwîste em kar , berhem û calakiyên saziyê ji hev re berbiçav bikin û binirxînin , pesnê qenciyan bidin , qelsiyên lome û rexnekin , û pêşinyaran ji paşerojê re pêşkêş bikin . Di vî warî de , em dikarin bêjin : Mamostên saziyê yên rêzimên ( 18 ) in , mamostên alfebê ( 59 ) in , Şagirtên rêzimên yên fêname wergirtine ( 47 ) in , Şagirtên alfabê yên fêname wergirtine ( 459 ) in , şagirtên rêzimên yên bi dawî nebûne ( 22 ) ne , şagirtên alfabê yên fêrbûna xwe kuta nekirine ( 51 ) in . ( 5 ) şevbuhêrk bi navê saziyê li

ser pêwîstî û giringiya zimên hatine li darxistin , û komîta rêvebir ( 5 ) civat girêdan . Namak vekirî rexneyî bi navê saziyê , R. Newroz , Munteda Nûredîn Zaza ya çandeyî û kovara Pirs li ser biryara bikaranîna alfebeya erebî ya Perlemana Kurdistanê Îraqê ji kek Mesûd , perleman û hikometê re hate rêkirin . Namak vekirî bi navê Saziye li ser yekirina rojmêra kurdî ji gelek cigehên entirnêtê re bi rêbû , û di rojnama Newrozê de belav bû . Daxuyana damezrandinê wergerî erebî û Ingilîzî . Tozik wergerî erebî . ( 25 ) pirtûk rêzimên ya Dr. Kamîran Memê Alan û Dr. rozad hatin çapkirin . ( 500 ) pirtûk rêzimên ya Rozad Elî hate kirin . ( 300 ) pirtûk ya destpêka rêzmên ji bo saziyê hate kirin . ( 800 ) Alfebe hate çapkirin . Simbolek ji bo Saziye amede bû . Kulîkek ji zimên bi navê Saziye ta ( 4000 ) hejmar li ser rîya çapkirinê ye . Û ji bilî gelek xebatên devkî yê nirxûbuha di mal , civat , û cîyên kar û xwendinê de li ser giringiya bikaranîna zimanê dê li şûn zimanên biyanî . Li rex van karên hêja pêdivî û gerekî hebûn em tê de bi ser neketin . Vêca em ji bo wê loman ji xwe dikin . 1- me nikanî bingehek ji Saziye re li Şam , Reqê û kobaniyê avabikira . 2- Herêmên di weke herêma Heleb nikanî tu çalakiyên aborî ji bo danheva sermiyanekê ji xwe re bikirana

Vêca pêşinyarên me ji bo paşeroja Saziye ev in:

1- Di sala bê de , xebat ji bo jîholêrakirina kêmasiyên jorîn.

2-Pêwîstiya amedekirina pirograma kar jaliyê komîta rêvebir ve.

3-Çêkirina komîteyên pisporî ji aliyê komîta rêvebir ve , ji bo hêsankirina karê Saziye di rojên pêş de .

**Dawiya Hizêranê  
Komîta rêvebir  
Ya S.F.P.Z.Ks**